KURDO... BI DESTÊN XWE, EGER AYÊ TU BIRÎ

Şeban Mihemed Berwarî

Da ji vê pirsiyarê babetê xwe pê bikin, aya eger piştî 9/4/2003-ê roja azadiya Îraqê; her weku em kurd dibêjin, kurdan pişikdarî di ezmona siyasî di Îraqê de nekiriye, bi tinê avakirina wê maba bi hêviya xwedanên dersokên reş û spî ve, noke welatek da li cîhanê hebe navê wî Îraq?

Guman têde nîne eger bersiv ji layê vekeler û çavdêrên siyasî û hawelatiyên erebî û îslamî ve bêhête dan, dê nebe, Çinkû bi dîtina min çend alozî ya siyasî li Îraqê berfireh bibe û şerê taîfî dijwar bibe, ewende serkirdayetî ya kurdî û çivakê Kurdistanê ji layê xelkê Îraqê û berpirsên wê ve dêhêne gunehbarkirin. Ku ewan egerên hemû arîşên Îraqê; belam eger vê pirsyarê ji her takekî li her welatê demokrasî bike, eger xwe yê sade jî be û yê şarezayî siyasetê nebe, dê bêje: belê egerê mana Îraqê bi êk parçeyî heta noke kurdin. Girove jî di zorin vê çendê biselmînin. Baştirîn nimone jî demê gorên; herdu îmamên eskerî, li Samera hatîne peqandin, li wî demî eger bizavên zorîn serokomarê Îraqê Mam Celal û serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî neban, da şerekê zor mezin di navbeyna Sina û Şîa de peydabibe. Dibe biba egerê dabeşbûna Îraqê. Belam be pêçewaneyî ewan di gel vê kêşa noke li ser sinorî di gel Tirkiye, kurdan bi hemû hêza xwe bizavkirin ku nûner û siyasiyên herdu layena li ser êk mêzeyî kombikin û li beramber kenalên ragehandinê pêkve bidine axaftin, daku hawelatî û kerbvebûyên herdu layena aramiyek di navde bibe, ew bo vê bizavê sergirt û Îraq ji şerekê xwînawî rizgarkir. Eve karekê zor mezin bû kurdan beramber Îraqa noke êkgirtî û gelê wê yê bira encamdayî. Belê her weku kurd dibêjin kirmanc zû qenciyê ji bîr dikin. çinkû noke hevnetewiyên serokomar bara pitir ji wextê wî yê terxankirî bo bizavên êkirina gelê Îraqê û daku Îraqa wan ya erebî dabeş nebe, xelk û gelê wê yê eve hezar sale pêkve dijîn. Yên ketîne ber gef û gurên welatê Tirkiye û rojane şaroçke û gundên wan ji layê leşkerê wan ve yê dihêne topbarankirin

û sotin. Her weku ev kêşeye li Mozambîqêne ne li Îraqêne.

Bi rastî ev lawazî ya hindek helwîstan, yan bê helwîstiya erebên Îraqê, bitaybet ya mercîên dînî û siyasî ya, bê omêdeyeka mezin ya li nik civakê Kurdistanê peyda kirî. Di vî demî de, çinku rojane kenalên ragehandinê bi dehan fetweyên wan dixwînin bo raya gişti ya Îraqê, hemû jî di arestekirîne bo gelê ereb û berjewendiyên wan. Her weku çi netewên dî li Îraqê najîn, ji layekê dî ve û li demê aramî yê hemû dakokê li ser pêşengî û rişdiya xwe dikin, li seranserî Îraqê, belê bi daxeweji sinorên deverên mada 140-ê ji destorê Îraqê nabûrin. Eve jî hindê digehîne ku pêdivî ye serkirdayetiya kurdî çav xişandinekê di nexş û serbûrên xwe de yên çar salên bûrî de bikin beramber vê bê dengiya kujek.

Piştî terorîstan li Îraqê cihê pê xwe kirî û bûyîne xwedanên layengir, welatên cîran ji vê êşa vegir zor tirsiyan. Ji ber vê çendê piştî azadiya Îraqê welatê Kuweytê rabû daku çendekê ji sinorê xwe di gel Îraqê bi hêleka asinî rakêşe, li zorbeyî parêzgehên başûrî hawelatiyên wan xwepêşandan kirin û hêrîş kire ser wê hêla asinî. Ji layê serkirdên wan yên siyasî û rêberên wan yên ayînî ev çende bibezandin û veguhastina sinorî li qelam da û nêzîk bû ev kêşe zor mezin biba.

Aya eger ev leşkerkîşî ye ji layê welatê Sûdiyê veba bo ser parêzgehên naverast û başûrê Îraqê, her ev bê dengî ye ji layê hikûmeta navendî û gel Îraqê ve da hebe?

Aya eger noke li beramber gefên leşkerê Tirkiye ya mezheb Sine, ev bê dengî ya kujek hebe, pa sibehî eger welatê Îranê yê mezheb Şîe viya maytêkirinê di Kurdistanê de bike, erê %60 ji sedê xelkê Îraqê ji pêş Îranê ve bizavê nakin bi destên xwe û bi darê Îranê me pê biêşînin û ezmona me li Kurdistanê bi şêwînin û têk bidin? Başe eger ewên bankeşa êkbûna Îraqê bi ax û gel ve dikin, noke amade nebin di ragehandin û di helwîstên xwe de bergiriyê ji parçeyeka giring ji axa Îraqê bikin. Erê dê çawa bişên sibehî civakê Kurdistanê razî bikin ku zaroyên xwe hiking nexşê Îraqa êkgirtî li ser berperên pertokên xwe çêkin.

Bi rastî dem yê hatî serkirdayetî ya kurdî ji niha pêve her pêşhateyek û arêşeyeka li Îraqa erebî rû dide; merema min ji Hemrîn û pêde, xwe pêşeng û palewên nebînin ji bo çarekirina wan, daku bihayê wê bizanin.